

Agehiya grîng derbareyê Vîrusa Korona'yê

Slav gelî xelkê Helsîngborgê!

Vîrusa Korona'yê tesîr li ser me hemiyar dike. Ev ne tenê mesela vîrusê ye, her wesa, mesele ev e ku bi van qedexeyan, jiyana me jî tête guhertin. Em şarevaniya Helsîngborgê, ji bo em bişên li vê demê jiyana we sanahîtir bikin, guh bidin van amojgarî û pêşniyazên me.

Li ser vê rewşê wesa agehî peyda dikî

Nûke derbareyê Vîrusa Korona'yê Covid-19, agehiyên pir xelet belav dibin.

Li malpera helsingborg.se, me derbareyê karên şarevaniyê yên bo serkeftina li hevber vê nexweşiyê gelek agehiyên durust kom kirine.

Li ser vê malperê xetên internetê yên agehiyên dem û dezgehan ên derbareyê Vîrusa Korona'yê Covid-19 hene. Tu dişêyî her wesa pêwendî di gel şarevaniya Helsîngborg'ê ya bi vê telefonê bikî: 042-10 50 00. Heger te pirsyarên derbareyê vîrusê hebin, bo vê derê telefon bike: 113 13.

Kesên kalûpîr – hay ji xwe hebin

Li gor Folkhälsomyndigheten'ê (Dezgeha Tendurustiya Gelî), ew kesên ku ji ser 70-salî ne, yan jî di nav grûpa rîskî de ne, ev vîrus taybet bo wan xetereke mazin e. Divê tu pir hay ji xwe hebî û pêwendî di gel kesên dî nekî. Ev ne tenê bo qenciya xwe dikî, lêbelê bo xatirê hemû komelgehê jî vê dikî. Gerek e em hemû pêkve alîkariya hev bikin daku em hejmarê kesên pir gran nexweş dikevin û pêwîstî bi intensivvård'ê (sexbêriya tund) heye, kêr bikin. Heger gava te pêwîstî bi kirîna xurakê, yan kirîna dermanan hebe, hingê tu dişêyî telefon bo Helsîngborg kontaktcenter'ê bikî: 042-10 50 00.

Bêguman tu hîna jî dişêyî derkevî der û li bin tava buharê bo xwe bigerî. Gera li derve û li bin tavê baş e. Di gel xizm û kesên xwe yên nêzik û hezkirî, bi riya telefonê, yan jî bi riya komputerê pêwendî bike.

Te alîkarî divê, yan divê tu bi alîkariya yekî din rabî?

Tu dişêyî bi riya appa Nyby'yê alîkarî bo xwe yan bo kesên din bixwazî. Agehiyên li vê derbareyê, li ser malpera helsingborg.se hene, yan jî telefon bo Helsîngborg kontaktcenter'ê bike. Heger tu heq ji teknîka dijîtal tîyî, hingê vê appa Nyby'yê daxê ser telefona xwe. Bi vê riyê tu dişêyî pir bi hêsanî û pir zû, pêwendî di gel xelkê dî, yê ku pêwîstî bi alîkariyê heye, bikî. Yan jî heger te pêwîstî bi alîkariyê hebe, pêwendî bi xelkê re bikî.

Heger tu xwe ewle nebînî

Gênc yan kalûpîr, li van rojan, em hemî – ji ber gelek sedemên cuda, dişên xwe tenê bibînin û bitirsin. Ev hest dişê her dem li nik me peyda bibe. Heger tu kesekî temenbilind bî û te divê tu bi yekî re biaxivî, hingê pêwendî di gel yek ji van komên şarevaniyê bike. Tu dişêyî, xwe li ser vê xetê bigehî wan: helsingborg.se/traffpunkter.

Bila te hay ji cîranên te hebe

Li van rojan, ku em wisa pir li malê pêkve dimînin, ev dişê bibe sedema hêrs û xeyalşikestina li nik gelek malbatan. Heger tu, ji ketina yekî ya ber vê xeterê bitirsî, tu dişêyî pêşî lê bigirî. Li ser malpera huskurage.se hin amojgarî hene, nîşanî te didin ku tu çawa bişêyî li demên wisa alîkariyê bikî. Heger te pêwîstî bi alîkariya bi lez hebe, hingê pêwendî di gel Socialjouren bike: 042-10 64 65. Li ser malpera helsingborg.se/socialjour agehiyên bêhtir hene.

Kesên xwedî fîrma

Li vê dema berlêgirtinê ji ber qeyranê, ew kesên ku bêhtir tûşî probleman dibin, kesên xwedî fîrma

ne. Şarevanî hewlan dide, ku van kesan, bi zîrarên herî kêr bişên ji vê rewşê xwe derbas kin. Li ser malpera foretagare.helsingborg.se tu dişêyî agehî derbareyê wan xebat û çalakîyên şarevaniyê bixwînî.

Li ser malpera foretagare.helsingborg.se tu dişêyî agehiyên teze yê derbareyê çalakîyên li Helsingborg'ê û her wisa jî, ew pêşniyaz û çalakîyên ku li derveyî malê wê bibin, bibînî. Tu dişêyî her wisa jî, malpera şarevaniya Helsingborg'ê ya bi navê Helsingborgs stads Facebooksida, bişopînî û li wir agehiyên derbareyê qewimandinên li şarevaniyê bixwînî.